

## Himbêzkirina volkan

Renge berî vê nivîsê, her hebibe, lê yekem çirke ya sibêdeha dîrokê ve heta niha, pêywendiya li navbera mirovan, tejî alozî bûne ku li navbera hewcehî bi hev û li paşerojê de wek dijber çav lihevkirin, bûye!

dom»R:4






## Huner û mûzîka Kurdî bûye qurbaniya dagirkariyê!

Ku welatek dagirkirî be, çand, huner, stran, hezkirin û her tiştê wî welatî dê ji bo dagirkar û bi navê dagirkar bê tomarkirin.

Bajarên Rojhilatê Kurdistanê ên wek Kirmaşan, Urmiye, Hewraman û navçeyên din, bi dîrok û çanda xwe ya kevnar ve naskirî ne.

dom» R:7

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (483) 07-12-2024 Buha (1000) Tûmen*



## Sîstema totalîter serçaveya nepotîzmê ye

Di wan rojên derbazbûyî de destnîşankirina «Yûsif Pizişkîyan» ê kurê serkomarê Îranê – Mesûd Pizişkîyan- wek mişavir û berdestê ragihandinî yê serkomarê rejîmê ji aliyê Muhsin Hacî Mîrzayî yê serokê mekteba serkomar ve, pêlek nerazîbûne pey xwe ve anî û bû basek berfireh di medyayên cihêreng de.

dom» R:6

# Hewcehiya lezgîn

**Îro rojê ku wext teng dibe û egera ji destçona derfetê bo gelê Kurd heye**

Îro di demekê de ku bûyer dem bi demê dibne sedemê guhertinan û Rojhilata Nawîn avisê guhertinan e,

û wisa tête dîtin ku jiopilotîka nawçê bête guherîn û bandorê dabinê ser rewşa civakî û siyasî û cografiyayî û piraniya deshilata welatên nawçê tevdigerin ku pêşya pêla tunde wan guhertinan biguherin, hewceye ku netewa herî mezin û bê qeder û bê maf û dewleta xwe,

anku gelê Kurd jî mifahê ji wan pêlên guherinan wergire.

Divê gelê me amadekarî bo guhertinan hebe, ku di wan guhertinan de xwe wekî hêzekî xwedî bandor bide xuya heya ku aliyên ku biryara guhertinê li herêmê de dane, bikarin hisabê li ser hêz û bandora Kurdan bikin.

Ev xwedî bandoriya û nîşandana hêza Kurd jî tenê û tenê li yêkitî û yêk gotarî û yêk helwêstiya hêzên siyasiye Kurd li her çwar perçên Kurdistanê de ye.

Divê Kurd bikare di kar û dîplomasiya xwe de digel welatên xwedî hêz bide xuyakirin ku dikare bibe karekterekî sereke û li wan guhertinan de berjewendiya netewiye xwe hilince,

çimku tu carî li dîroka aliyê kêm 100 salên dawî de, bi qasê îro dewletên dagîrkerên Kurdistanê lewaz nebûne û bext yarê Kurdan nebûye.




Rêjîmên Îran, Turkiye, Îraq û Sûriye niha kevtine ber tirsa jinavçonê û hilopepkanê dikin ku belkî bikarin xwe ji sernixûniyê rabigrin, heta hekî lewaz û bê hêz û bêne qet qetkirinê jî.

Lewra dive Kurd ji wî bextê ku îro hatiye ber derî, xwedî derkeve û dev ji vê bela velaya nav xwe de bîne û nehêle derfeta zêrîn ji dest biçe.

Gotara Netewî, Gotara yêkrêzî, gotara dewlet xwaziyê, gotara xwedî derkevtin ji mafê netewî, gotara xelasiya ji bindestiya hikûmetên dagîrker, gotara çêkirina dewlet û welatê serxwebûna Kurdan,

dive bo hemî hêzên siyasiye Kurd li her çwar perçên Kurdistanê re bibin gotarên zimanê dîplomasiyê daku civatgeha cîhanî û welatên xwedî bandor ku rol li guhertinan de hene, bikarin li ser hêz û senga Kurdan hisabê bikin.

Hekî ev neyê kirin, renge bo 100 salên dine jî bext neyê ber derê Kurdan û carekî din dujminê Kurdan hinde zelûl û lewaz nebin.



## Pêşeroja "kûrahiya startejîk" a Komara îslamiya Îranê

R:5



## Ji Serdema Ortê virve koçberkirina kurdan

R:10

# Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 16ê Sermaweaz, roja kêmendaman

## Ev êş û jana ku hûn dikêşin li dilê me deye jî

**Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 16ê Sermaweaz, roja kêmendaman**

Li pêvajoya xebata mafxwazaneya tevgera Kurdistanê û Hizba Dêmokrat de, kêm nînin ew pêşmergeyên qehreman û têkoşer ku li çepera beravaniyê de yan bi sedema teror an bombebaran û êrêşên mûşekî yên komara Îslamiya Îranê bo ser binkeyên Hêza Pêşmerge de mixabin bi tundî birîndar bûn û beşek ji cesteya xwe fîdayê doz û rêbaza gelê xwe kirine.

Yek ji wan rûdawên tal û nexweşane ku mînakek bo diyarîkirna roja kêmendamên Hizba Dêmokrat e, bûyera tal a terorkirina têkoşerê navdarê Hizba Dêmokarat a Kurdistana Îranê, Mamosta "Mela Hesen şêweselî" ye ku li vê rojê de ew rêzdar bi rêya çend kirêgirtiyên komara Îslamiya îranê ve bi sedema teqîna bombeke cihgîrkirî li nav pirtûkekê de bi dijwarî birîndar bû û çend beş ji cestê xwe ji dest dan.


Bêguman ew bûyerên tal, neku nekarîne derbê ji wirekiya xebatkarên bi bîr û bawer ên hizba Dêmokrat bide, belku bi gemr û guriyeke zêdetir li meydana xebatê de man e û eva ku li şiyana wan de bûye li pêxema azadî û rizgariyê de kirin e.

Lewma li cihê xwe de ye ku li vê rojê de li hember fîdakarî û cangorîkirina wan têkoşeran de em destê rêzgirtin li ser singê xwe dabinên û bibêjine wan:

"Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi çavê rêz û pêzanînê ve, mêzeyî hemû keda we dike û jan û êşa ve bi jan û êşa xwe dizane.

Xuya ye ku li rojimêra Rêkxirava Netewên Yekgirtî de jî rojek wek roja cîhaniya Kêmendaman hatiye diyarîkirin ku ew jî nîşaneya girîngîdana Rêkxirava Netewên Yekgirtî bi vê beşa civaka mirovî ye, lê cuda ji wan kêmendamên ku zikmakî kêmendam bûne, an di bûyereke çavrênekirî piştre beşek ji cestê xwe ji dest dabin, mixabin li nav gelê me de kêm nînin ew kesên ku bi destê rêjîmên desthilatdar bi ser Kurdistanê de û li encama şerê sepandî bi ser Kurdistanê an teqîna mîn û cebilxaneya paşmawên şer, tûşî kêmendamiyê bûne, li cihê xwe de ye ku ji hemû waran ve zêdetir bêne berçavgirtin.

Lê mixabin komara Îslamiya îranê nek her awirekê jî bi vê beşê li




civaka derbepêketiya Kurdistanê nade, belku bi avayê sîstematîk mafên wan binpê dike.

Li wan çend salên dawiyê de û li pêvajoya tevgera Jîna

"Jin Jiyan Azadî"yê de jî hejmarek li lawên têkoşerên welatê me li dema xwenîşandanên ser şeqaman an li girtîgehan de ji aliyê hêzên cinayetkar ên rêjîma komara Îslamiya Îranê, beşek ji cestê xwe û bi taybet çavên xwe ji dest dane û fîdayê doza rizgariya gel û welatê xwe kirin.

Ew jî tevî birîndarbûna dijwar, bi şêwazên cur bi cur û taybet, çalakî û xebata xwe didomînin. Lewma li vê rojê de em hemû, rêzê ji fîdakarî û jan û êşên wan digrin û dibêjine wan ku em birîn û jana we, bi birîn û jana xwe dizanin û bi hev re û bi hevkarî û alîkariya hev, xebata xwe heta serkevtina yekcarî, didomînin.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê rojê de anku 16 ê Sermawezê bi roja hemû Kêmendaman, rêz ji fîdakarî û keda we digre.

Bê guman xebat û xweragiriya we ezîzan dibe mînak û sembol û sermeşqa ciwanên îroye me û hûn jî wek remza fîdakarî û xweragirî û kela berxwedana gelê me ne.

Bi wê hiviyê ku encama xebat û tekoşîn û hevdem jankîşan û keda we yê xweragir, azadî û rizgarbûna gel û welatê me ji jêrdestiyê be.

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**15 ê Sermaweza 1403 a Rojî, beranberî 5ê Disambra 2024an a Zayînî**



# Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 25ê November




**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 25ê November, peyamelk belav kir, li beşeke vê peyamê de hatiye ku Komara Îslamî, tundûtîjiya li hember jinan kiriye yasayî û welatê Îranê bo jinan kiriye girtîgehek mezin.**

**Deqa peyamê wiha ye:**

25ê Novemberê ji aliyê kora giştî ya Saziya Netevên Yekgirtî ve, wek roja cîhanî ya nehiştina tundûtîjî li dijî jinan diyarî kiriye û her salê çalakiyên curbicur li piraniya welatên cîhanê û balkêşandina civakan û hişyarkirina wan li derheq wan tundîtîjiyan bi rê ve diçin ku çi li çarçoveya malbat û çi ji aliyê civakê û bi taybet bi şêwaza sîstematîk ji aliyê damezraveyên desthiltdar li dijî jinan têne kirin.

Saziya Netewên Yekgitî, tevî navdêrkirina 25ê Novemberê bi roja cîhaniya nehiştina tundûtîjiya li dijî jinan, hejmarek konvansion û lihevkirinên navnetewî erê kirine ku wan dewlatan han bide, bi rêya danîna yasa û mobîlîzekirina hizra giştî bo sekinîn li hember sitema dîrokî li derheq jinan, rawestan li hember hemû curê tundûtîjiyeke li dijî jinan bisekinin.

Piraniya welatên Rojavayî bi têgihîştin li giringiya rola jinan li geşekirina civakê li hemû waran ve, pêngavên mezin bo nehiştina tundûtîjî li dijî jinan hilgirtine û tevî pêbendbûn bi biryarnameyên navnetewî yên taybet bi parastina mafê jinan, binyateke hizrî û praktîkên hişyarkirina civakî û kêmrengkirina hizra mêrsalarî, çê kirine û amarên tundûtîjî li hember jinan gihandine asta herî kêm.

Tundûtîjî li hember jinan, diyardeyeke dîrokî ye ku li hemû welatên cîhanê de bi qasek cuda tê dîtin ku berhema mêrsalarî li warên cuda yên jiyana civakî de ye.

Anku heta vê demê, ku hevsengiyek li navenda biryardan li meydana lîstoka siyasî, aborî û civakî de pêka vekheviya zayendî neqewime, em nikarin çavrêyê dawîhatin bi tundûtîjiyên li dijî jinan bin.

Li Îrana li jêr desthilatdariya komara Îslamî, cudatîdanîna zayendî wek yek ji binyatên girîng a desthilata îdeolojîkî ya rêjîmê, tê birêvebirin û tevî banghêjiya pêbendbûn bi beşek ji lihevkirinên taybet bi mafê mirov ku tê de mafên jinan jî tê de hatine diyarîkirin, rewşa jinan roj bi roj ber bi xirabtirbûnê ve çoye.

Komara Îslamî, tundûtîjiya li hember jinan kiriye asayî û welatê Îranê kiriye girtîgehek mezin bo jinan, ku tê de mafên herî destpêkiye wan têne binpêkirin û tundûtîjiya sîstematîk a dijî jinan wek binyateke hizrî çav lê tê kirin û bo cîbicîkirina vê dezgeh hatine damezirandin.

Tevî wan hemû givaşan, jinên Îranî her ji destpêka hatineserkar a vê rêjîmê ve bêdeng nebûne û tevgereke berfireh a civakî li hember dezgehên tepeserkar ên hikûmî û dab û resmên paremayî yên civakê û malbatan bi rê xistiye.

Şoreşa "Jin Jiyan Azadî", bilindahiya tevgera mafxwazaneya jinan bû ku bi mezintirîn û miciditirîn serhildana giştî li heyama desthilatdariya Komara îslamî heta niha tê hisêb.

Beşdariya berfireh a jinan li vê tevgerê de, serhildanek şoreşvanî li dijî desthilata mêrsalar li malbat û civakê de bûye û bûye sedema guherînên mezin li pêgeha jinan de.

Bê şêwazekê ku tpeseriya hovane ya dezgehên rêjîmê, neînku nekarî jinan ji xebata mafxwazaneya wan dûr bixe, belku micidtir ji berê, şeqam û cihên giştî kirine meydana xistinebinpêya siyaseta dijejin a vê rêjîmê.

Redkirina yasayên dijejin ên Komara Îslamî ji aliyê jinan ve li pêvajoya şoreşa "Jîna"yê de ku berhema xwehesiyan ji maf û erkên xwe, xaleke herî girîng li tevgera mafxwazaneya jinan e û ti desthilatek nikare rê ji pêla rijde vê bigre ku mizgîniya nehiştina tundûtîjî li derheq njinan daye.

Jin li Rojhilatê Kurdistanê û li pêvajoya şoreşa "Jîna"yê, tevî xebat li çepera vekhevîxwaziya zayendî, roleke karlêker û bêmînak li mafxwaziya siyasî û netewî de hebûye û bi girêdana sitema zayendî û netewîre, li hember desdthilata dijejin û dijekurd a Komara Îslamî sekinîne û li vê pêxemê de dehan şehîd û birîndar dane û hejmareke zêde jî hatine girtin û bo girtîgehan hatine veguhastin.

Rojhilatê Kurdistanê ku dîrokek dewlemend ji kultûra rêkxistin û hizbatiyê de heye, bi kiryar bû pêşengê vê serhildanê û jinên Kurd, xweragirî û bivêriyeke bê mînak li meydan û şeqamên bajarên Rojhilatê Kurdistanê de tomar kirin.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranbê tevî rêzgirtin ji 25ê Novambrê, roja nehiştina tundûtîjiya li ser jnan, pêbendiya xwe bi hemû lihevkirinên taybet bi parastina mafên jinan, dubare dike û Komara îslamî bi dujminê jimare yek ê mafên jinan dizane û li ser wê baverê ye ku rizgariya jinan ji tundûtîjiyê bi hemû curên xwe ve, bi herîfîn û nemana rêjîma Îranê tê kirin.

Hizba Dêmokrat her ji destpêka avakirina xwe ve, xebata jinan li bidestveanîna mafên netewî û civakî de bi bilind nirxandiye û li vê pêxemê de hewl daye ku jinan bo bidestveanîna mafên wan, rêkxistin bike.

Beşdariya berçav a jinan li refên Hizba Dêmnokrat li hemû qonaxên jiyana vê Hizbê û li beşên cuda de, nîşanderê vê rastiyê ye ku jinên Kurdistanê bi serastî têgihîştine ku rizgariya jinan û rizgariya netewî, hevterîb li Hizba Dêmokrat de nirxê pê têtê dan.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberiya Giştî**

**4ê Sermaweza 1403 a Rojî, beranber bi 24ê November 2024 a Zayînî**

# Himbêzkirina volkan



N. Kerîm Perwîzî
W. Bêhzad Simko

Renge berî vê nivîsê, her hebibe, lê yekem çirke ya sibêdeha dîrokê ve heta niha, pêywendiya li navbera mirovan, tejî alozî bûne ku li navbera hewcehî bi hev û li paşerojê de wek dijber çav lihevkirin, bûye!

Ji aliyek din ve, mirovan bo man li ser cografiyek tejî dirînde û canliberan û karesatan de hewceyî bi hev hebûye û ji aliyê din ve hemû alav, tişt û hewcehiyên berdeweambûn li jiyanê, sînordar bûne û lewma jiyana mirovek bi wateya kêmkirina par û beşa mirovek din bûye!

Ew dualîbûn a jiyana mirovan, anku hewceyî bi hev û li hemen demê de wek rikeberdîtina hev, dîrokek ecêb ji xoşewîstî û bihevrebûn û li hemen demê, tejî tawan û jinavbirina hev, afirandiye.

Li vê meydana tejî alozî de çemkên curbicur peyda bûne û her yek bi awayek şirovekirina rewş, daxwazî û kerbek bûne!

Yek ji girîngtirîn a wan çemkan, aramî an ewlehî an parastibûn e!

Aramî li jiyana mirovî de ji erxahînbûn bi berdewamî pêk tê! Ja ev erxahînbûn dikare warê tendirûstî heta erxahînbûnê li dabînkirina xwarin heta ewlehiya netewî û niştimanî, li xwe bigre.



Li hemû ast û rêjeyekê de heta erxahînbûn li tendirustiya zaroka malbatekê û dabînkirina şîr bo vê zarokê heta asayişê wek mînak peymannameya NATO ku welatên xwdî hêz tê de hevpeyman in, hemû yek tiştî dixwazin, erxahînbûn li berdewamiya wan anku ji sibêya xwe erxahîn bin! Lewma aramî, kiryareke îroyî bo erxahînbûn ji sibê anku paşerojê ye.

Lê her ew aramiya dikare bi dijî xwe jî kar bike! Em bînin ber çavê xwe ku li şikeftên kevnar de mirovên Niyandirtal jiyane û li demekê de yek ji wan bo têrkirina zaroka xwe û dabînkirina aramiya zaroka xwe, êrîş dikire ser cîranê xwe û xwarina wî ji wî distand, heta birsîtiya zaroka xwe çareser bike.

Lê cîranê wî êrîşê dike ser wî û bi kewiran serê zaroka wî pan dike!

Li pêxema dabînkirina aramiya zaroka xwe, jiyana zaroka xwe torand!

Ev çîrok bo niha jî aşna ye, wek mînak dema em dibînin Potîn(Serkomarê Rûsiyê) bi gotina xwe li beranber zêdexwaziyên NATOyê de êrîşê dike ser Ukraynê û dixwaze aramiya Rûsiyê dabîn bike! Lê tûşî şerekî dibe ku wek gera nav çemê Avê, hemû tiştên Rûsiyê dihloşîne, bi aborî û ewlehî û hêza serbazî û pêywendiyê ve û heta herifîna hivî û daxwaziyên dehan milyon xelkê Rûsiyê!



Aramî bi tenê nayê dabînkirin û girêdayê bi çemkek din a mirovahiyê ya bi navê mafê jiyana kesên din ve girêdayî ye.

Mirovê Niyandirtal bi mirina zaroka xwe tê gihîşt ku nikare aramiya xwe li ser hisaba bi gefçêkirina bi ser jiyana kesên din, dabîn bike.

Li cîvaka îro ya mirovahiyê de ew çemk wateyek bi navê vekheviyê heye.

Bi vê wateyê ku mafê jiyana kesên din, demekê rêz jê tê girtin ku mafê vekheviyê pê bêdan.

Vekhevî ew çemke ye ku hevsengî û balansa şer û nebûna aramiyê radigre.

Bêyî vekhevî, aramiyek nayê çêkirin û hekî aramî li ser bingeha nevekheviyê bê avakirin, anku sitemeke giran hatiye kirin ku her demekê dikare biteqe û jiyana civakê wek bahozekê tûşî rojreşiyê bike.

Li rewşek wiha ku sitem tê kirin û vekhevî nemaye, renge mirov bo heyamekê bisekinîne yan bi tepeserkirinê bi şêwazekê bêdengbûnê bi ser de bisepîne, lê ev bêdengî bêdengiyek dilxwaz û aramîhêner nîne.

Bêdengiyek ku li welatekî wek welatên Skandînavî heye, li vê cura aramiyê ye ku erxahînbûn ji sîstemê ye ku mafên wan diparêze, lê bêdengiyek li cura li Îranê yan Sûriyê, bêdengiyek sepandî ye ku her demek dibe ku bê şikandin.

Li rewşa sitema rût û sepandiniyê de mirov wek dijî sîstema sepandî disekinin û nevekheviya sepandî bi qasekê ew bêzar kirine ku li jiyana xwe de penah bo her alavekê bo nehiştina sitemkariyê dibin û ji her derfetekê ku peyda bibe, li sekinîn li hember vê sitemkariyê, xwe naparêzin.

Rewşa nevekheviya sepandî wa li civakê dike ku li her lerzîneke vê sîstemê dibe mezintirîn daxwaziya wan û lewma li her cihek wek Sûriyê ku zêdetir ji 5 dehikan e ku kêmîneya zordar, sitem li piraniya xelk û netewên din ên li Sûriyê de dike, xelkê bêzarbûyî, volkanê hibêz dikin!

Şerê navxwe û kuştin û malwêranî dilxwaza mirovên awsayî yên civakê nîne lê, sitem û bêdadî ew bi qasekî bêzar kirine ku pêşwaziyê li şer dikin û volkanê himbêz dikin heta ku hemû pêywendî û tor û şûnwarên desthilata sitemkar bişewitînin.

Çon bo pêşewaziya volkanê li kerbê sitem û bêdadiyê, rewşa niha ya Sûriyê û ya paşerojê li Îranê ye jî.

# Pêşeroja “kûrahiya startejîk” a Komara îslamiya Îranê



N. Îsmaîl Şerefî
W. Bêhzad Simko



Rewşa îro û 13 salên derbasbûyî ya xelk û welatê Sûriyê, rontirîn mînak a encama siyaseta bûn a Komara Îslamiya Îranê li wî welatî ye. Welatek ku hemû çavkaniyên ser erd û binerdên vê ji nav çone û qet û beşek vê, li jêr bandora welatekî dûr û nêzîk de ye.
Welatek ku hêj nekariye pişta xwe li jêr êrîşên DAÎŞ û şerê navxwe rast bike, bo careke din tûşî şerekî navxwyî û ji derve bûye ku sedema herî bingehîn ji vê fitne û alozî û destêverdanê, Komara Îslamiya Îranê ye.

Komara îslamî bi hêceta şer digel DAÎŞê, spaha quds bi fermandehiya Qasimj Silêmanî bo Sûriyê şand ku li heyama zêdetir ji 10 salan li hember hêzên opozîsiyon a rêjîma Beşar Esed de sekinî û hezaran kes ji xelkê bêtawan kuştin û xelkê Sûriyê bi xwe jî dizanin ku Qasim Silêmanî û spaha wî çi cinayet li wî welatî de kirine.

Hêcata Komara Îslamiya Îranê bo çona nav Sûriyê, hekî aliyeke îdeolojîk a Şîegeraneya li jêr navê “parastina Herem” heye ku armanca wan cihê gora “Zeyneb” a keça “Îmam Elî” anku “mizgevta Hezretê Zeyneb” e, beşa herî bingehîn a rêrewîkirtin li siyaseta diyarîkirina kûrahî ya stratejîk bû.

Li vê derheqê de hem “Elî Xamineyî” rêberê rêjîmê û hem hejmnareke zêde bi gotina wan bi xwe şareza û teorîsiyenên rêjîmê digotin, ew şerê li bajarên wek “Heleb, Reqa û Demişq”ê de dikin bo vê yekê ye ku wî şerî li bajarên wek “Têhran, Îsfehan û Tewrêzê” de nekin. Bi wateyek din îdiaya vê dikirin ku bi amadebûna hêza serbazî wek mînak li Sûriye û Îraqê hene, karîne ewlehiya Îranê biparêzin.

Heta li warê teblîxî û midyayî ve jî bi mezintirnîşandana şer û kawilkariyên vê li Îraq û Sûriyê ku sedema bingehîn a wan, rêjîma Îranê bi xwe bûye û heye, ji aliyêk xwe radikîşan ku karîne Îranê ji ketin li rewşeke wiha biparêzin û ji aliyê din ve jî xelkê xebatkar û bêzarbûyî ji rêjîma wan li navxweyî Îranê ji “bi Sûriye bûnê”, Îranê bitirsînin.

Li heyama çend rojên derbasbûyî de ku hêzên dijberî Beşar Esed û berçavtir ji hemûyan “Tehrî El-Şam” karîn li 72 demjimêran de beşek ji bajarê Helebê û derdora vê ku li dema xwe de Qasim Silêmanî bi spaha xwe ve bi encamdana dehan cinayet û kuştina hezaran kesên bêtawan, li wir cihgîr bibûn, ji hêzên Beşar Esed û şêwirkarê Komara Îslamiya Îranê, paqij bikin û konsolxaneya rêjîmê li wî bajarî bêxin jêr kontyrola xwe, bo hemû kes û aliyekê derkevt ku siyaseta Kûrahiya stratejîkî ya Koma Îslamî, li ser çi binyatekê betal, hatiye avakirin.

Eva rêjîma Beşar Esed û ji vê girîngtir xelkê Sûriyê mijîûlê dana baca vê ya rojane ye, hevdestî digel komara Îslamî û amadebûna şerxwazaneya vê rêjîmê li wî welatî de ye. Beşar Esed ku guh bi daxwaziyên demokratîk ên xelkê û welatê xwe bi armanca danûstandinên siyasî neda û wa dihizirî ku dikare bê guhdan bi balkêşandin û têbîniyên civaka navnetewî û welatên dûr û nêzîk, destvkirîîbûna komara îslamî berdewam be, dibiya çavrêyê rojên wiha jî bikirba.

Niha rewşa aloz û şerlketiyê Sûriyê bi tenê bi rêjîma Beşar Esed û dijberên wî yên navxweyî nayê şirovekirin, her çawa ku ew welat zêdetir ji 10 salan her beş û qetek vê li jêr desthilat û bandora hêz û dewleteke din de ye.

Komara Îslamî bi hilgirtina alaya “bihêzkirina bereya muqawimet” li deverê, bilî geşkirina agirê şer û dijheviyên navxweyî li Sûriyê, bûye sedema handan û bizivandina Rojavayiyan û welatên derdor ku li alî û şiroveya cuda de bandora vê rêjîmê li Sûriyê, qebûl nakin.

Li pêvajoya agirbest a li navbera Îsraîl û Lubnanê de Serokwezîrê Îsraîl “Netanyaho bi eşkere ragihand ku li ser livlivîna Îranê li deverê tundir dibin. Bo welatên Erebî jî ti gumanek nîne ku Sûriye bo wan opêşîneyeke dîrokî li pişt e ku bandora eniya Şîe li wir cih nabe. Bo tirkiyê jî ku nêzî 10 sal e bi dehan kîlometran hêza xwe li bakûrê wî welatî de cihgîr kiriye û bi şêwazek gumana handana neyarên Beşar Esed jî li ser heye, karê spaha quds li Sûriyê bi hêsanî nikare qebûl bike.

Hekî li çarçoveyek berfirehtir a navnetewî û dewletên mezin ve jî mêzeyî rewşa Sûriyê bikin, Rûsiya bi armancgirtina hêzên dijberî Beşar Esed bi rêya hêza esmanî û tohmetbarkirina Koşka Sipî bi handana Îsraîl û aliyê dijberê Beşar Esed, kar bo mana xwe li wî welatî de dike, Amerîka jî tevî ku dûrbûna xwe ji Tehrîr El-şamê ragihand, bûna hêzên komara Îslamiya Îranê û bandora siyasiya vê rêjîmê li Sûriyê, bi sedema vê rewşê dizane ku nikarin bi vê yekê bê helwîst bin.

Eva ku bo her kurdekê zêdetir cihê baldan û girîngîdanê ye, Rojavayê Kurdistanê û helwîsta hêza siyasiya vê beşa Kurdistanê û welatê Sûriyê ye. Mixabin Rojavayê Kurdistanê bi gelek sedemên heşîmetî, jêopolîtîkî û bi qasekê jî hizrîna îdeolojîkiya hêza serdest û gelek sedemên din, bijardeyên dilxwaz li ber dest nînin. Lewma neçar e li nav bijardeyên nedilxwaz û bi neçariyan de ew jî bi awayek demkî û taktîkî, çalak be.

Li dawiyê de maye bibêjin, Komara Îslamiya Îranê ne ku nekarî li welatên din de û dûr ji sînorên xwe, bi ser dujmin de bi ser bikeve û ewlehî û aramiyê bo xwe û rêjîma xwe bi diyarî bîne, belku pêyên xwe danîbe ser kîjan cih û welatekê, tûşî şer û malwêranî û şikestê kiriye. Darayî û samana xelkê welat li pêxema îdeolojiya xwe ya reş li Îraq, Sûriye, Lubnan, Felestîn û Yemenê de heder da û bilî vê ku ew welat tûşî şerê navxwe û deverî kirin, xelkê welatê xwe jî li hejarî û bêhivîtiyê de hiştiye. Bi şêwazekê ku li asta navxweyî, deverî û navnetewî de tûşî dehan kirîzan bûye û ji çavê glên Îranê û gelên deverê jî wek diyardeyeke reşnav û reşkiryar tê mêzekirin.

# Sîstema totalîter serçaveya nepotîzmê ye



N. Elî Munezemî



Di wan rojên derbazbûyî de destnîşankirina «Yûsif Pizişkîyan» ê kurê serkomarê Îranê – Mesûd Pizişkîyan- wek mişavir û berdestê ragihandinî yê serkomarê rejîmê ji aliyê Muhsin Hacî Mîrzayî yê serokê mekteba serkomar ve, pêlek nerazîbûne pey xwe ve anî û bû basek berfireh di medyayên cihêreng de.

Ew bas hind bi germ û gur bû ku eger kesek ne şarezayê kultûr û sîstema civakî, sîyasî û aborî a Îranê neba, yê jêve ba ku ewa yekimîn care ku tiştek hinde bi qebahet û bi wî rengî li sîstema Îranê de diqevime.

Di zanistên sîyasî de bi bûyerekê re ku kesek ji ber pile û desthilatdariya xwe, feydeyê bi neheq bigihîne nasyar yan kesûkarê xwe û yan jî bi neheqî post û meqam bide wan, dibêjin nepotîzm.

Nepotîzmê di sîstema desthilatdariya Îranê de reh û kokê dîrokî heye.

Eger em zêde dûr neçin, her di dema desthilatdariya xanedaniyên Qacar û Pehlewî de, rêveberî bi gelemperî li ser girêdanên malbatî, girêdanên eşîrî û dilsoziya kesane bo piledaran û malbata desthilatdar bû.

Vê pratîkê kontrola elîta desthilatdar li ser çavkanî û navendên biryargirtinê misoger dikir.



Ew yeka li serdema rejîma îslamî a Xumeynî de jî ku elîteke nû derket holê ku ji mela, endamên Pasdarên Şoreşê û malbatên wan pêk dihat û toreke nû ya bandorê ava kiribûn, dom kir û da eyankirin ku weha xislet û taybetmendiyek parek ji sîstemên totalîter û dîktator e.

Li ber ku esasê desthilatdariyê li Îranê de, li ser hizra patrimonyalîzmê hatiye danîn.

Di wê şêweya birêveberiyê de, hemû hêz li destê gupika sîstemê de ye.

Di wê mijarê de ferqa navbera desthilatdariya giştî û taybet nîn e.

Di wan cure rejîman yan sîsteman de ku sazî yan rejîmên otokratîk an olîgarşîk in, qatên civakê yên jêrîn, navîn û jorin ji desthilatdariyê dûr dixin û rêberan di wê sîstemê de desthilata mutleq hene.

Li ber wê yekê jî çanda siyasî ya Îranê di hêla dîrokî ve li dora dilsoziya kesane ya ji rêberan re dizivire.

Lewra di Îranê de, ji aliyê piledaran ve endamên malbat û hevalên nêzîkê wan ji bo rolên sereke pêştir tê dan.

Ew wan postan jî bi meseleyên olî yan ewlehîye ve girê didin û bi wê hêcetê cehdê dikin ku wê dabeşkariyê rewa bidin nîşandan.

Ewa di demekê de ye ku armanca wan ya sereke ewaye ku li rêka tora kesên nêzîke xwe ve bikarin dest danin ser bingahên girîng yên ekonomik yên dewletê û wan bo berjevendiya xwe bikar bînin.

Li serdema niha de ku dorpêçên aborî yên navnetewî li dijî rejîmê zêde bûne, destê piledaran bo gendelî û nepotîzmê zêde vekiriye.

Li ber ku piledarên rejîmê û hevkarên wan çavkaniyên giring monopolîze dikin.

Nimûneya berçav ya nepotizmê ne kurê Pizişkiyan e, lê Mojteba Xamineyî, kurê Elî Xamineyî ye ku xwediyê hêzek nefermî ya girîng e û mezintirîn gendelkarê Îranê ye.

**Ew kesên ku Pizişkiyan li ber nepotîzmê rexne dikin, li çend grûpan pêk tên:**

**1.** Rikeberên Pizişkiyan di nav sîstema desthilatdariyê de ku bi sedema wê yekê Pizişkiyan bûye serkomar, ewan şansê xwe bo nepotîzm û gendeliyê li dest dane û li ber rikeberiya xwe, dixwazin wê meselê ku li gor kultûra siyasî, civakî û aborî li Îranê de normal e, mezin bikin. Yanî li esas de wê yekê bi xelet nizanin lê li ber ku rikeberê wan ewî karî dike, gazinde ne.

**2.** Grûpên nawendgera yên dijberê rejîmê ku ew jî li esas de her baveriyek wek Pizişkiyan û karbidestên din yên rejîmê hene û tenê li ber ku wê sîstemê naxwazin, lê sîstemeke din a totalûter dixwazin, wê yekê mezin dikin.

**3.** Grûpên azadîxwaz yênrasteqîn ku hem wê yekê ku ji aliyê Pizişkiyan û mohreyên din yên rejîmê hatiye kirin û hem jî rejîm û desthilatdariya totalîter bi giştî şermezar dikin û wê yekê wek karaktereke sîstemên totalîter bi xelet dizanin û dixwazin xelk wê bizanibe.

Ez baver im ku xelk kakil û naveroka rejîmê nas dike û ewî karê Pizişkiyan li hember ew cinayetên ku rejîm rojane dike, hind piçûk dibîne ku serê xwe pêve naêşîne û li pey derfetekê digere rejîmê û Pizişkiyan bi hev re bibe aliyê nemanê ve.

## Nerîna



**“Rêber Ehmed”:**

**“ Hikûmet û gelê Kurdistanê ji hincetên Bexdayê bêzar bûne”**




**“Mela Bextiyar”:**

**“Em li ser lidarxistina 27mîn festîvala Gelawêjê di sala bê de micid in”**



**“Antony J. Blinken”:**

**“Şer û pevçûnên Sûriya ji ber tevlîhevbûna biryarên di navbera Rûsiya û Îranê de ye”**



**“Vladimir Putin ” :**

**“ Divê demildest êrîşên komên tundrew ên li dijî Sûriyeyê bi dawî bibin”**

# Huner û mûzîka Kurdî bûye qurbaniya dagirkariyê!



**N. Eskender Ceiferî**



Ku welatek dagirkirî be, çand, huner, stran, hezkirin û her tiştê wî welatî dê ji bo dagirkar û bi navê dagirkar bê tomarkirin.

Bajarên Rojhilatê Kurdistanê ên wek Kirmaşan, Urmiye, Hewraman û navçeyên din, bi dîrok û çanda xwe ya kevnar ve naskirî ne.

Mûzîka Kurdî ya Dîwanî li Urmiyê, Siyaçemane li Hewramanê û herwisa Horeya Yarsanan jî beşek ji dîroka Kurdistanê ne ku li kêleka rîtmên Hewramî, ji kevnartirîn rîtmên mûzîka Kurdî ne.

Ji 8 salan beriya niha ve dagirkarên Îranê bicîkirina Biryara UNESCO li Îranê dane sekinandin. Karvedanên çalakvanan jî nikarin rêjîmê neçar bikin li vê biryarê vegere.

Mehekê berî niha hin çalakvanên Kurd ji rêjîma dagirkar xwastin li biryarê vegere. Lê belê bersiv ev bû ku niha rêjîm mijûlî tiştên girîngtir e.

Li gor wê biryara UNESCO, diviyabû dewleta dagirkar ji bo pêşxistina çand û zimanên neteweyên ne Fars li Îranê tevbigere. Navê wê destûrê weke pêşxistina berdewam a civakê jî hatibû naskirin.

Bi sekinandina Biryara UNESCO 2030’an ji aliyê dagirkar ve, bê guman neteweya Kurd jî bi çanda xwe rastî metirsiyê tê.

Elî Xamineyî rêberê rêjîma Îranê ragihand ku ew belge, çanda welatên rojava ye û Îran rê nade bê bicîkirin ji ber ku li gor Xamineyî, ev biryar destnîşan dike ku divê heya sala 2030’an çanda Îslamî li Îranê nemîne û neteweyên cuda û jin û karker jî li wî welatî bibin xwedî maf.

Wek tê zanîn, ev rêjîm li ser bingeha zext û givaşan û herwisa têrorîzmê hatiye avakirin.

Lewma jî her tişta ku dijatiya îdeolojiya wan bike, li wir rêpêdayî nîn e.

Bi vê biryara Xamineyî, gelek ji çalakvanên Kurd, dengê nerazîbûnê hildan.

Komeke mûzîkjenên Yarsanî li Kirmaşanê ragihandin ku êdî bi sekinandina vê destûrê, Îran zêdetirî berê rê li ber asîmîlasyonê vedike. Heman mûzîka ku di her du rêjîmên Şah û Xumeynî de rastî zêdetirîn givaşan hatiye, êdî dîsa dikeve ber pêla bêrehmiyê.

Wan mûzîkjenan, nameyek ji parlamenterên Kurd ên Kirmaşanê re şandin û têde tekez kirin ku heke ew biryara UNESCO neyê bicîkirin, dibe ku mûzîka Kurdî ya herî kevnar li Kirmaşanê ku navê wê mûzîka Yarî ye, ber bi jinavçûnê ve here. Ew dibêjin qirkirin, ne tenê kuştin e.

Lê belê dema ku bûdceya wezareta Çandê, ji mûzîka Kurdan re tê qedexekirin, wê demê êdî ew nûzîk ber bi jinavçûnê ve diçe.

Ew herwisa dibêjin heke çanda Kurdî jî li Kirmaşanê li gor reşnivîsa 17 xalî ya biryarnameya Neteweyên Yekbûyî li Kurdistana Rojhilat di nava 6 salan de bêyî cudahî ji jin û zilaman re bê vegotin, êdî bandora modêrnîteyê jî li ser çanda kevnar namîne û ya Îslamê jî.

Lê piştî çend heyvan ne wezareta Çanda Îslamî bersiva wan daye û ne jî parlamenterên Kurd. Bi vî rengî jî xuya dibe ku ew nûneratiya Kurdan nakin û ji bo wan tenê posta wan li meclîsa rêjîma dagirkar girîng e.

Riftara Îranê bi çandên cuda re ne li gorî biryarên Neteweyên Yekbûyî ye ku li gor wan, her kes bêyî ku rastî cudahiya ji ber nîjad, reng, zayend, ziman, ol, baweriya siyasî an jî yeke din jêbûna netewî an jî civakî, saman, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwerirtina ji hemû maf û azadiyan e û divê dewlet li pişta wan bin.

Li Îranê ne siyaseta Kurdî li gor van biryarên NY cih girtiye û ne jî çanda Kurdî ji aliyê dewletê ve tê dîtin. Lewma jî hemû çalakî li Kurdistanê bi berçavka ewlehî têne dîtin.

Rêjîma dagirkar a Îranê, qet naxwaze mûzîk û bi taybetî jî ya kevnar bê pêşxistin. Ji ber ku Elî Xamineyî di fetwayekê de dibêje guhdariya mûzîkan, derfeta gunehan çê dike. Li gor vê fetwayê jî, êdî wezareta Çanda Îslamî, ti pereyekî ji bo pêşxitina warê mûzîkê terxan nake û bicîkirina wê niha li Kirmaşanê ji parêzgehên din zûtir destpê kiriye.

Heke li welatên pêşketî, girîngiyeke taybet a çand, huner û mûzîkê heye, lê li Îranê, divê hemû tişt, Îslamî û li gor biryara dagirkariya Îrsnê bin. Lewma jî qet xweşiya dilê xelkê Kurdistanê, ji bo desthilatdariya Tehranê girîng nîn e.

Ev jî di demekê de ye ku salane bi milyardan pere li stranên ji bo piştevaniya rêjîmê têne mezaxtin. Lê belê ew stranên ku xwediyên nasname û dîrokê ne, rastî pêla bêrehmiya dagirkar tên. Xelk jî bi vê mijarê hesiya ye û li gelek navçeyan, bi avakirina navendên serbixwe yên çand û mûzîkê, hewla parastina nasnameyê didin.

# Li parlemana Ustraliyayê de semînareke Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi rê ve ço

Semînareke Hizba Dêmokrat a Kurdiastana Îranê bi beşdariya hejmarek parlemantar û siyasetvanên Ustraliya li Parlena wî welatî de bi rê ve ço.



**Roja Pêncşemî 1ê Sermawezê, beranber 21 November 2014, semînareke taybet li ser pirsa Kurd li Îranê, li Parlema Ustraliyayê de bi rê ve çon, li wê semînarê de ku ji aliyê Komîteya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û Lobiya Kurd li Usraliyayê hatibû rêlkxistinkirinê, hejmarek Paremantar, Senator û siyasetvanên Ustraliyayê tevî beşdarîkirinê, gotar jî pêşkêş kirin.**

Li destpêka semînarê de Xatûn "Jîna Lînoks" bi nûneratiya lobiya kurd li Ustraliyayê, baseke giştî li ser pirsa siyasî û rewşa ewlehiya Kurd li Kurdistanê û siyasetên dewletên desthilatdar bi ser qedera Kurd li hemû beşên Kurdistanê, pîşkêş kir.

Bawe Rizayî Berpirsê Komîteya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li bajarê Adêlaydê, duyemîn kesê vê semînarê bû ku bas ji vekirina karnameya terorîstî ya sapah pasdaran li Kurdistan, Îran, dever û cîhanê kir û pêdegirî bi ser hewcehiya bi terorîstnaskirina spaha pasdaran ji aliyê hemû welatên azad û demokratîk kir ku yek ji wan Ustraliyaye.

Li beşke din a vê semînarê de girte vidyoya axaftina rêzdar "Xalid Ezîzî" berdevkê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê hate pêşkêşkirin.




Rêzdar Xalid Ezîzî li destpêka axaftina xwe de îşare bi rewşa şer û necihgîrbûna aramiya devera Rojhilata Navîn û rol û karlêkeriya rêjîma Îranê li hemû kirîzên siyasî û ewlehiyên deverê û berfirehtirkirina terorîzma navnetewî kir û piştre li awireke rexnegirane de li derheq siyaseta civaka cîhanî li hember komara Îslamiya Îranê li heyamên derbasbûyî de rohnkirin da û got ku hekî welat û civaka cîhanî li dema xwe de di cihê lihevkirin û nermînîşandan digel Komara Îslamî li hember siyasetên derstdirêjker û kirîzçêkerên rêjîmê li welatên deverê û piştevanîkirina vê rêjîmê li terorîzma navnetewî, helwîst û berteka hewce û bersiva wan heba û lêpirsîn jê hatiba kirin, niha rêjîma Îranê nedikarî bi vê şêwazê devera Rojhilta Navîn tûşî agirê şer û rikeberiyên bi xwîn û aloziya siyasî bike.

Berdevkê Hizba Dêmokrat li beşeke din a axaftinên xwe de bi îşarekirin bi tev kirîzên siyasî yên navxweyê Îranê ji aliyê desthilatdarên rêjîmê û yek ji wan serkuta mafên netewan e, bas ji bername û siyasetên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê kir.

Xalid Ezîzî li vê para axaftina xwe de ragihand ku Hizba Dêmokrat li ser vê bawerê ye ku çareseriya pirsa Kurd û netewên din li Îranê û herwisa nehiştina cudatîdanîn û kirîzên li wî welatî, dêmokrasî ye.

Ew dêmokrasiya jî demek cihgîr dibe ku sîstema siyasî li paşeroja Îranê li ser bingeha hevparî û beşdariya netewan û hemû curbicuriyên wî welatî bê avakirin.

Herwisa yasya binereti ya Îranê tevî îtirafkirin bi rastiyên civaka Îranê û curbicuriyên vê, maf û azadiyên hemû pêkhateyên wî welatî dabîn bike û rengvedana dêmokrasiya lihevkirî li ser binyatên demokratîk bo hevpariya siyasî ya hemû curbicuriyan li Îranê de be.

Li beşeke din a vê semînarê de "Selah Pûresed", berpirsê Komîteya Hizba Dêmokrat li Ustraliyayê basek bo rohnkirina rewşa aloz a penaberên Kurd ên Îranê û dijberên siyasetên rêjîma Îranê bi taybet li Başûrê Kurdistanê kir ku li heyama salên derbasbûyî de çendîn caran kevtine ber êrîşên mûşekî yên rêjîmê û dehan kes şehîd û birîndar bûne.

Piştî axaftinên wî, xatûn "Ronak Rad" a ednadama Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê gotarek li ser rewşa aloz a jinên Kurd û Îranê û herwisa binpêkirina mafên wan ji aliyê rêjîma Îslamniya Îranê pêşkêşî beşdarbûyên semînarê kir.

Li beşeke din a vê semînarê de "Giraham Pêrît" ê Nûnerê Parlemana Federal, bas ji siyaseta dewleta Ustraliya li hember Komara Îslamiya Îranê kir û got ku li 2 salên derbasbûyî de 200 endamên spaha pasdaran û birêveberên dadgehên înqilab ên rêjîmê ji aliyê welatê wî ve li lîstê terorîstan zêde kirine û li vê derheqê de pêngavên zêdetir jî dê hilgirin û givaşên me bo ser Komara Îslamiya Îranê dê hêj zêdetir bibe".

Li beşa din a Semînarê, Senator "Pol Skar" li axaftinên xwe de ragihand ku spaha pasdaran, hêzeke terorîstî ye û hewce ye ku li lîstê rêkjxiravên terorîstî, bê zêdekirin û em jî hewla xwe didin ku vê armancê bigihînin encamê.

Heyeta Hizba Dêmokrat piştî bi dawîhatina semînarê û piştî nîvro, kombûnek digel "Tîm Witat" ê cihgirê Wezîrê Derve ya Ustraliyayê û 2 şêwirkarê wezareta Derve li karûbarên Îran, Îraq, Sûriye û nîvdorgeya Balkan, kombûnek lidar xistin.

Li vê kombûnê de bas û mijarên hûrtir li ser rewşa siyasiya rêjîma Îranê û xelk û civaka Îranê û bandora piştevanîkirina derve li tevgerê û nerizayetiyên siyasî yên navxweyî Îranê hate kirin.

# Îro hêza herî mezin, hevrêzî û tifaqa li ser esasê hişmendiya netewî ye!



**N. Cano Amedî**




Ji sed salî zêdetir e ku sîstema dagirkerîyê hebûna xwe li ser stratejîya red û înkarê didomîne. Komara tirs û xwînê hebûn û desthilatdarîya xwe bi sîyaseta komkujî û jenosîdan daye meşandin û ew hewldan, ew sîyaset îro jî berdewam e!

Ev dewleta ku hebûna xwe li ser tunebûna milletên din ava kirîye, di heman pêvajoyên tengasîyê de, benîştê xapandinê belav kirîye, rojevên derewîn afirandîye. Bi gotinên "biratîyê" û "ummetê" rojev tayîn kirîye; xwestiye milletê Kurd bi sîyaseta entegrasyonê bixapîne.

Em dibînin ku ev siyaset, îro jî di rojevê de ye. Li ser navê dewleta mêtîngehkar alîyên siyasî lîstoka "polêsên qenc û xerab" dilîzin. Ji alîyekî ve qala pêvajoya "çareserî"yê dikin, lê li alîyê din jî gefan dixwin. Karekterê dewletê li ser civatê têra xwe xwedî bandor û bihêz e. Hemû beşên civatê sibêroja xwe spartine "hêvî" û duayên weke "Xwedê zewalê ne de dewletê", ev hişmendî bi serê xwe xeterî û kûrahîya nexweşîya civakî nîşan dide.

Dîrokê daye îspatkirin ku her tişt, herkes xwedî temenekî ye; împaratorî, dewlet, hêz, serok û pêxember jî bi dem û temenekî ve sînorkirî ne. Jiyanek bêsînor û bêdawî tune ye. Herkes, her tişt xwedî çîrokekê ye. Xemlandin û balkişandina ser naveroka çîrokê girêdayî aktorên çîrokê ye.

Dinya di pêvajoya berbanga guhertinên girîng de ye. Dewlet û civatên ku vê pêvajoyê dibînin, amadekarîyên xwe li gorî wê berbangê amade dikin. Bûyer û rûdanên ku îro li herêma me diqewimin, ne bûyerên ji rêzê û herêmî ne. Divê em baş bizanibin ku ev pêlên ba û bahozên dijwar wê rê li ber guhertinên mezin vekin û tesîrê li jiyana me jî bikin. Ji ber wê yekê divê em xwedî hişmendî û zanyarîyeke netewî bin ku di berbanga wan guhertinan de, em bikaribin di paşeroja welat, netewe û jiyana xwe de xwedî biryar û xwedî hêz bin.

Dinya ne dinya sed sal berê ye, ne ya deh sal berê ye. Hişmendî û hêvîyên îroyin jî ne xewn û xeyalên doyîn e. Her pêşketin û guhertinên civakî bi xwe re hişmendîyeke nû derdixe holê. Her dewlet li gorî berjewendîyên desthilatdarîya xwe tevdigere, nexşerêya dahatûya xwe plan dike. Her millet, her civat dixwaze ji vê pêvajoyê sûdê bigire. Em baş dizanin ku hûqûqa şirîkatî an cîrantîyê, li gorî hêz û berjewendîyên gelemperî, li gorî hişmendîya neteweyî tê tayîn kirin. Erdnîgarîya Kurdistanê di nav hêzên dagirker de hatîye dabeşkirin, li her beşên Kurdistanê hiqûqa dijmînatîyê desthilatdar e û li hemberî gelê Kurd xwedî şirîkatîya dijberîyê ne. Li hemberî vê rastîyê pêwîst e hemû beşên civatê, hemû alîyên kurdî bi berpirsîyarî û hişmendîya neteweyî tevbigerin, bi siyasetek neteweyî rê li ber çareserîyêke rasteqîn vekin. Ev erkên neteweyî ye û pêwîst e ku rojek zûtirîn bicîh bê.

Di vê pêvajoya îroyin de, gava em pirsên xwe ji civata Kurd bikin, ez bawerim di warê bersîvan de wê rewşeke din derkeve holê. Lewra, lawazîya hişmendîya neteweyî, bandora sîyaseta îdeolojîk û berjewendîyên hîzbî, grûbî û bêrexistinbûyina hêzên neteweyî wêneyeke gelek xirab radixe ber çavan. Ev wêne dibe sedem ku hestê bêhêvîtî û derûnîya têkçûnê di nav civata Kurd de zîl bide. Mixabin rastîya civata Kurd li holê ye. Sedemên vê rastîyê gelek in; ji dorpêçkirina pir alî û îtîfaqên navnetewî bigirin, heta problemên navxweyî rê li ber sîyaseteke netewî digre, di fetisîne. Hewldanên hene jî ji ber ku têr nakin an jî nikarin wê dorpêçkirinê perçe bikin, ev jî dide xuyakirin ku ji peydekirina rêgehek nû dûr in.

Em dikarin di gerînoka çil salên dawîyê de li sedem û sebebên wan alozî û qeyranên sîyasî bigerin, niqaş bikin, binîrxînin û şîrove bikin… Lê belê rastîya civata me, derûnî û sosyolojîya civata sîyasî ne amadeye ku bi derbasbûyîna xwe re rûbirû bibe. Ev jî rê li ber pêwendî û diyalogên medenî digire û bendavên sarbûnê ava dike. Demsalên ji hev dûrketinê, nexweşîyên gilî û gazindeyan geş dike û di navbera alîyan de dîwarên bêbawerîyê bilind dike. Herkes li gorî rewşa xwe û li gorî berjewendîyên xwe, xwe mafdar dibîne. Ji ber wê yekê jî tu kes naxwaze li yê din gohdar bike. Mixabin, ev bêdengî, bêhelwestî û sîyaseta sê meymûna, bingeha ji hev sarbûnê û dûrketinê xweştir dike!

Rewşa îro ku em bi hevre dijîn gelekî xeterî û tahlûkeyên mezin nîşanî me dide. Çewa sed sal berê bapîren me ji ber bê îttîfaqîyê derî li ber têkçûn û bêhêvîtîyê vekirin, divê em rê nedin ku cardin kêmasî û şaşîyên dîrokî dubare bibin. Şert û mercên îroyin, derfetên pêwendî û diyalogan, rê û rêbazên têkoşîneke hevbeş, bingeha hişmendîya neteweyî û organizasyona rêxistinbûyîna hezên neteweyî li gorî şertên sed sal berê hêsantir û amadetir e.

Ji ber wê yekê tu luksa kesî tuneye xwe paşve bikişîne û rê li ber nîzama dijî gelê Kurd veke. Herkes li gorî şert, qewet û hişmendîya xwe, li gorî derfet û zanîna xwe, divê mil bide xurtkirina xeta neteweyî. Pêwîstîya me bi aqlê kurdî, bi hişmendîya neteweyî û bi têkoşîneke hevbeş heye. Ji bo wê jî, diyalogên ku ji armancên stratejîk re xizmetê bike; zimanekî çêkir û kurdperwer, rexneyên ronak û hevdû temam bikin ji me re pêwîst e!

Divê gotin û kiryarên me di pratîkê de hevdû temam bikin. Divê em siyaset û enerjîya xwe li hemberî hev seferber nekin. Berevajî, li ser me hemûyan ferz e ku em bi hevre enerjî û sîyaseta xwe li dijî desthilatdarîya dagirkeran û sîstema mêtîngehkarîyê seferber bikin. Bi hînbûnên îdeolojîk yên sed sal berê, bi şîrove û nîrxandinên teng, bi ezberên pêncî sal berê, bawer bikin em dê nagihîjin tu derê. Divê em hemû baş zanibin ku li ser dijberîya taxên hev, pêşketin ne mumkun e û em nikarin bi vê şêweyê xwe bi rêxistin bikin.

Divê kar û xebatên me, hewldan û diyalogên me, li ser bingeha hişmendîya neteweyî û bi armancên stratejîk ve girêdayî be. Divê nexşerê û plansazîyên me yên hevbeş ji bo bidestxistina mafên me yên ji milletbûnê tên bixwe be. Bi kurt û kurmanci, divê pêvajo û tecrubeyên Qoçgirî, Şêx Seîd, Dêrsim, Agirî, Gelîyê Zîlan û polîtîkayên heta îro hatine meşandin, ji bo me hemûyan bibe lembeya peravên deryayê. Divê tecrube û dîroka têkoşîna hemû beşên Kurdistanê ji bo me bibe lembaya yekrêzîya hestên niştimanperwerî û aqlê Kurdî.

# Ji Serdema Ortê virve koçberkirina kurdan



**N. Sidîq Bozarslan**



Her çiqas di navbera Yavuz Sultan Selîmê Osmanî û Îdrîs-î Bitlîsîyê Kurd da peymanek di 1514an da çêbûbû û li gora wê peymanê di şeran da kurdan esker didan osmanîyan jî, ev têr nedikir ku osmanî kurdan ji cîwarên wan nekin û bi demografîya civata wan ra neleyîzin. Wek Mamoste Celal Temel wan koçkirinan rêz kirîye, ez dixwazim bi kurtî wan pêşkêşî we hêjayan bikim:

Di pêvajoya şerê ku di navbera Şah Îsmailê Sefewî û Yavuz Sultan Selimê Osmanî da di 1514an da çêbûbû, kurdan alîkarîya osmanîyan kiribû; lê ji herêma ku diket navbera Musul û Îranê, Eşîreta Kurdên Şêxbizinî jibo herêmên Ankara – Konyayê û bi taybetî Haymanayê ku girêdayê Ankarayê bûye, hatine şandin.

Di dawîya sedsala 16. an û despêka sedsala17.an da Şah Abbasê Îranî, hin civatên kurd jibo herêmên cuda yên Îranê belav kirîye. Di heman deman da Dewleta Osmanî jî hin kurdên Dêrsimê rêkirîye herêma Horasanê ku dikeve bakurê Îranê.

Koçberkirineke mezin jî di dawîya sedsala 18.an û despêka sedsala 19.an da pêk hatîye jibo Anatolîyê. Bi taybetî di dema serhildana Mîr Mihemed da ew koçberî zêde pêkhatîye.

Ji herêmên Malatya û Adiyamanê Eşîreta Rişvan (Reşî) û Eşîretên Canbegî (Cihanbeyli) hatine şandin bo herêmên Konya û Ankarayê ku berê jî Şêxbizinî jibo wir hatibûn şandin.

Osmanîyan bi vî awayî ji bo sedemên cuda di sedsala 19.an da jî kurdan rêkirin bo herêmên Konya – Ankara û bi taybetî jibo herêma derdora Gola Xwey (Tuz Gölü).

Wer dibe ku derdorên Gola Xwey bi hezaran cîwarên kurdan çêdibin. Wek ku îro tên binavkirin li herêmên Haymana, Aksaray, Bala, Cihanbeyli, Kırşehirê, Kulu, Polatlı û Şereflikoçhisarê, gelek gund û qesebe ji kurdan pêkhatine ku ew di seranserê sedsala 19.an da ji koçkirinê peyda bûne.

Di dema Şerê Cîhanî yê Yekemîn da jî ji herêmên Erzurum, Bedlîs û Wanê dora 700- 800 hezar kurd hatine koçberkirin jibo Anatoliyê.

Ji sisêyan diduyê wê nufûsê ji ber nexweşî û şertên giran ên rêwîtîyê di rîyan da mirine.

(Di rastîyê da derdora nîv milyon – 5000 hezar- kurd di wê rêwîtîyê da hatine kuştin) Dora 300 hezarên ku gîyane Anatolîya Navîn; ji wê nufûsê jî gelek hindik kes vegerîyane cîyên xwe yên berê.

Vekirîye ku van koçberîyên surgûnê jî di bin hukmê Cemîyeta Îttîhat Terakkiyê da pêkhatîye.

Bi tabîreka dî ev politika koçberkirinê, dema padîşahên osmanîyan despêkirîye, Tirkçîyên Îttihatê wê berdewam kirine û paşê jî Kemalistan heman politika domandine.

Heman politika di Berxwedana Dêrsimê da jî berdewam dike ku rastê 1937- 1938an tê. Dîsa bi dehhezaran mirî û bi dehhezaran jî tên surgûnkirin.

Ev politika qirkirin û surgûnê di pêvajoya şerê çekdarîyê yê PKK da jî bi awayeke cuda berdewam kir.
Tê gotin ku di navbera 1987- 2005an da derdora 3 milyon kurd ji cîwarên xwe bûne û koçê herêmên cuda yên Anatolîyê kirine. Ji ber encamên şerê PKK di navbera salên 1984- 1990an da bi hezaran gundên kurdan hatine valakirin û şewitandin.( 4)

Wek jêrenotek li vir divê ez di çarçoveya koçberkirinê da nirxandina Garo Sasuni lê zêde bikim ku wî jî li gora raporeka dizî ku ji destê tirkan ketîye destê kurdan û wî jî wê ji kurdan sitandîye ku dema mirov li encamên koçberkirinê binêre, nuqteyên ku di wesîqeya dizî da hatine nivîsîn, tiştên mantiqî ne, jibo dewleta osmanî. Nirxandina G. Sasuni bi kurtî weha ye:

Di dema Şerê Cîhanî yê Yekemîn da ji dervayê Wezareta Hundûrî ya Dewleta Osmanî "Mudurîyeteka Umumî (giştî) ya Koçber û Reîsîya Eşîretê" jî hebûye. Mudurê wê Şükrü Kaya Beg bûye ku ew paşê di Hukumeta Ankarayê da bûye wezîrê ziraatê. Tanzîmên di nav wê sazîyê da li gora 5 fermanên dizî hatine rêvebirin / pêkhatîye.

Li gora wê fermana dizî, piştî surgûnkirina ermenan, kurd jî dê werin surgûnkirin jibo bajarên tirk. Amanca sereke jibo wê surgûnê ew bûye ku li herêmên şer, têkilî û hevkarîya kurd û rus û ermenan çênebe.

Li bajarên rojhilatê divê firset neyê dayîn ku piştî surgûn û qirkirina ermenan, nufûsa kurdan bibe piranî.

Li gora madeyeka dizî, dema kurd werin koçberkirin, berpirsên dewletê yên sivil û eskerîyê, di rîyan da muameleyeka welê jibo wan koçberan bikin ku ew herî zêde xisarê bibînin.

Yanî bi awayeke vekirî ferman hatîye dayîn ku koçberên kurd jî wek ermenan di rîyan da werin qirkirin. Loma di encamê da ji kurdên koçberkirî yên 1916an, nufûseke gelek hindik gîyane Adanayê, Konyayê û Ankarayê.

Ew kurdên ku gîyane cîyên surgûnê jî, di nav şertên giran ên birçîbûnê, sitarbûnê û wd. da hatine hiştin ku ji ber wan mercên nebaş, gelek ji wan jî mirine.

Şertên wan fermanên dizî yek jê jî ew bûye ku li cîyên cîwarbûyî jimareyên surgûnîyan divê li gora %5 were tanzimkirin.

Yanî 5 kurd di nava 100 tirk da werin cîkirin ku ew bi lez werin helandin. Axiftina tirkî jibo wan koçberan wek mecbûrî hatîye qebûlkirin da ku kurdîya xwe jibîr bikin û bibin tirk.

Cuwanên kurd û ew kesên rêvebir wek serekeşîr, axa, beg û wd. divê ji wan surgûnîyan jî werin dûrxistin jibo cîyên hê dûrtir. Ji bil destûrê divê kes nikaribe cîyê xwe biguherîne.(5)

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## 18 saziyên mafê mirov ji bo Miradî û Ezîziyê bang kir



18 rêxistinên mafên mirov ên li Rojhilatê Kurdistanê daxwaz kir ku cezayê bidarvekirina girtiyên siyasî yên Kurd Werîşe Miradî û Pexşan Ezîziyê were betalkirin ku di Girtîgeha Evînê ya Tehranê de girtî ne.

Ji bo Werîşe Miradî û Pexşan Ezîziyê çalakvanên ji Rojhilatê Kurdistanê yên ku di tebaxa 2023yan de ji aliyê Pasdarên Şoreşa Îranê ve hatibûn binçavkirin, cezayê darvekirinê hatiye dayîn.

18 rêxistinên mafên mirov ên li Rojhilatê Kurdistanê bang li rêveberiya Îranê kir ku çalakgerên kurd serbest berde.

Rêxistinên ku daxuyaniyeke hevbeş belav kir, tekez kirin ku cezayê bidarvekirina girtiyên siyasî yên kurd Werîşe Miradî û Pexşan Ezîziyê ku di girtîgeha Evînê ha Tehranê de girtî ne, binpêkirina eşkere ya prensîbên mafên mirov e.

Di daxuyaniyê de hat gotin ku divê civaka navdewletî zextê li rayedarên Komara Îslamî ya Îranê bike û daxwaza betalkirina cezayê bidarvekirinê bi giştî û biryara betalkirina bidarvekirina van 2 girtiyên kurd bi taybetî hat kirin.

Rêxistinan diyar kir ku mafê Ezîzî û Muradiyê yên darizandina adil hatiye binpêkirin, ji mafê parastinê bêpar mane û rastî îşkenceyên giran hatine.

Pexşan Ezîzî di 4ê tebaxa 2023yan de li Tehranê bi hinceta têkiliya wê bi hêzên opozîsyona kurd re heye ji aliyê Pasdarên Şoreşa Îranê ve bi malbata xwe re hate binçavkirin û ew birin Girtîgeha Evînê.

Werîşe Miradî jî di 3yê tebaxa 2023yan de di navbera Merîwan û Sineyl de ji aliyê hêzên Pasdarên Şoreşa Îranê ve hatibû binçavkirin û bi hincetên bi heman rengî cezayê bidarvekirinê lê hatibû birîn.

Rêxistinên mafên mirov pêşniyar dikin ku divê cezayên li dijî Îranê bên zêdekirin û diyar kirin ku zext, îşkence û neheqiya ku li girtiyên siyasî yên weke Ezîzî û Miradiyê tên kirin, li dijî pîvanên navneteweyî ne.

## Rêjîma Îranê sizayê bidarvekirinê bi ser ciwanekî xelkê bajarê Urmiyê de sepand



Welatiyekî xelkê bajarê Urmiyê ku li pêvajoya tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de hatibû binçavkirin, ji aliyê rêjîma Îranê ve bi tohmeta kuştina besîcekî vê rêjîmê, sizaya bidarvekirinê bi ser de hatiye sepandin.

Pêka rapora “Hengaw”ê, “Mêhrab Ebdulazade” yê temen 26 salî, xelkê bajarê Urmiyê ku li pêvajoya şorişa “Jin Jiyan Azadî”yê de ji aliyê hêzên Îtilaata rêjîmê ve hatibû revandin û çendîn heyvan li jêr îşkence û lêpirsînan de bûye, li taya 1 a dadgeha înqilab a rêjîmê li bajarê Urmiyê de bi dadweriya “Necefzade”, bi tohmeta “bexî”, sizaya bidarvekirinê bi ser de hatiye sepandin.

Pêka vê raporê, rêjîmê tohmeta kuştine besîcekî bi ser “Mêhrab Ebdullazade” sepansdiye û wekî “bexî, hatiye dadgehîkirin.

“Mêhrab Ebdullazade” li demsala payîza 1401 a Rojî, li pêvajoya tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê ve hatibû revandin û bo girtîgeheke îtilaata rêjîmê li wî bajarê de hatibû veguhastin, navbirî çendîn heyvan li îşkencegehên rêjîmê de bi awayekî hovane hatibû îşkencekirin û kevtibû ber lêpirsînan, piştre navbirî bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Urmiyê hate veguhastin û nêzî 2 heftiyan berî niha, bo benda siyasî ya vê girtîgehê, hatiye veguhastin.

## Bidarvekirina lezgîn li Îranê de berdewam e



Rêjîma Îranê bi awayê nêvincî, her rojê 5 kesan bidar diveke û sepandina sizaya bidarvekirinê û herwisa rêjeya bidarvekirinan li Îranê, zêdetir dibe û rêjîma Îranê vê yekê wek alaveke serkutkirina xelkê bi kar tîne.

Pêka dawî amarên belkavbûyî, roja Sêşemî 6ê Sermawezê, Cehangîr(Muslim) Rehîmî xelkê bajarê Seqizê li girtîgeha rêjîmê li bajarê Seqizê de hate bidarvekirin û “Şîrelî Terkeşbend” ê xelkê bajarê Sehnê li girtîgeha lakan a rêjîmê li bajarê Reştê, hatiye bidarvekirin.

Herwisa li girtîgeha Qizilhisara rêjîmê li bajarê Kerecê de Riza Şêrzêhî û Hamid Pakdil û 2 kesên din ku nasnameya wan nehatiye zanîn, hatine bidarvekirin û li girtêgehên rêjîmê li Meşhed û Şêrazê de jî 2 kes hatine bidarvekirin.

Li girtîgehên rêjîmê li bajarê Îsfehan, kerec, Gurgan û Sawê de jî 6 kes hatine bidarvekirin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (483)